şopdara rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 506 14-Kanûn- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Li Helebceyê Mihrîcana Hinaran destpê kir

**Li kampa Eyn Îsayê ku bi hezaran koçber lê dimînin zehmetiyên jiyanî yên rojane berdewam dikin. Rêxistinên alîkariyê di vê mijarê de bi berpirsyariya xwe ranabin. Rêveberiya Kampê tevî derfetên xwe yên kêm bi hatina zivistanê re hewl dide pêdiviyên koçberan bi cih bîne.**







Rêveberiya kampa Eyn Îsayê li gel pêşkêşkirina alîkariyên rêxistinên mirovî yên sînordar, hewl dide pêdiviyên koçberan di demsala zivistanê de bi cih bîne.

Li kampa Eyn Îsayê ya ku bi 1 km dikeve bakurê bajarok, derdora 13 hezar koçber ji bajar û herêmên cuda yên Sûriyê û penaberên Iraqê dimînin û dabeşî 2 hezar û 800 konan dibe ku 2 hezar û 400 malbatan dihewîne.

Rêveberiya kampa Eyn Îsayê ya girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê ji bo peydekirina pêdiviyên koçberan ku bi hatina zivistanê re zêde bûne û bi hevkariya rêxistinên ku li kampê kar dikin û alîkariyên sînordar pêşkêş dikin, xebatan dimeşîne.

### ALÎKARIYÊN RÊVEBERIYA KAMPÊ

Rêveberiya kampê rojane 5 hezar torbeyên nan li koçberan belav dike û ji her koçberekî re 4 nan dikeve.

Li gorî gotinên Hevserokê Rêveberiya Kampê Celal El-Eyaf, rêveberiyê 600 konên koçberan ên ku ji ber rewşa hawayê di van demên dawî de zirar dîtine guhertiye û yên nû dane wan. Her wiha Rêveberiya Kampê li benda başiya rewşa hewayê ye heta ku hezar û 400 konên din biguhere.

Bi rêya hilmijek avê bi hêza 2 hezar û 400 bermîl av, rojane her koçberek 40 lître av werdigire. Ji aliyekî din ve Rêveberiya Kampê bi koordîneya yek ji rêxistinên mirovî ku li kampê kar dike pakêtên xwarinê yên mehane ku pêdiviyên koçberan ên rojane peyda dike, belav dike û ji zêt, şekir, nîsk û maqarne pêk tê.

Tevî wan xebatan rêveberiyê dibistanek di destpêka sala borî de ji bo 500 xwendekaran vekir û 12 mamoste ji koçberan bi vê mebestê erkdar kir. Li aliyekî din rêveberiya kampê bi Rêxistina UNICEF'ê re koordîne dike ya ku 3 hezar û 500 xwendekar pêşwazî dike.

Di warê tenduristiyê de rêveberiya kampê ambulansek ku 24 saetan dixebite ji bo veguhestina rewşên awarte ji nexweşxaneyên nêz re li Girê Spî, Kobanê û Reqayê diyar kiriye û her wiha dermanxaneya kampê bê pere dermanên weke antîbiyotîk, dermanên zarokan, serom û dermanê nexweşiyên din pêşkêş dike.

### AVAKIRINA DERFETÊN KAR

Têkildarî mijarê El-Eyaf destnîşan kir ku di gavekê de ji bo sivikkirina barê koçberan ew rojane ji bo 2 hezar koçberan derfetên kar peyda dikin. Jê 280 di nav rêxistinên ku di nav kampê de kar dikin ên mehane ku bi awayekî asayî li koçberan tên belavkirin da ku hemû koçber derfeta kar bi dest bixin.

Girêdayî mijarê koçbera bi navê Nîmet Hesûn diyar kir ku ew niha weke hemşîre li gel Heyva Sor a Kurd dixebite û destnîşan kir ku wê bi rêya Buroya Xebitandinê ya girêdayî rêveberiya kampê kar bi dest xistiye.

Bi kêmbûna pileyên germahiyê û barîna baranê di zivistanê de koçberên kampê ji ber sermaya zêde li gel tunebûna alavên germkirinê zehmetiyan dikişînin.

Ji bilî rêxistina Heyva Sor a Kurd û Komseriya Bilind a Karûbarên Koçberan, 20 rêxistinên ku li kampê kar dikin, ruxset ji Komîteya Rêxistina Mirovî ya girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê girtine pêdiviyên koçberan ên rojane weke xwarin, derman û pêdiviyên zivistanê peyda nakin.

Girêdayî vê mijarê u koçberên bi navê Leyla Mehmûd û Mihemed Yasîn destnîşan kirin ku ji ber tunebûna amûrên germkirinê, ew ber papora gazê xwe germ dikin.





Zehmetiyên koçberan bi kişandina rêxistinekê ku xwarinên germ ji koçberan re pêşkêş dikir piştgiriya xwe ji xwaringeha kampê ku 5 hezar û 500 km xwarin amade dikir, zêde bûne.

Rêxistinên tenduristiyê tenê şêwirmendiya tenduristî ji koçberan re pêşkêş dike û nexweşan vediguhêzîne dermanxaneyên taybet derveyî kampê da ku dermanan bikirrin, bi vê yekê rewşa madî ya koçberan paşguh dikin.

Li gorî Endama Rêveber a Heyva Sor a Kurd Leyla Elî , tenê heyvê xebatên tenduristiyê ji koçberan re pêşkêş dike û rojane 150 rewşên nexweşiyê wekî zikçûn, nexweşiyên derûnî, jin û çermê pêşwazî dike.

Hevserokê Rêveberiya Kampê Celal El-Eyaf destnîşan kir ku rêxistinên ku li kampê kar dikin bangên wan ji bo peydakirina pêdiviyên zivistanê û avakirina cihawazên ji çîmento da ku av derbasî kampê nebe û belavkirina cilên zivistanê û alavên germkirinê li koçberan paşguh kirine.

### ZIBIL LI KAMPÊ KOM BUYE

Ji ber xemsariya rêxistinên ku berpirsên paqijiyê ne, çop di nav kampê de kom bûye û ji ber wê koçber ditirsin ku nexweşî li kampê belav bibin.

Rêveberiya kampê tekez kir ku ew ê pirsgirêkê bi rêya nûkirina peymana bi rêxistina têkildar re çareser bikin...ANHA

şopdara rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 506 14-Kanûn- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Nîvê Hecînê hat rizgarkirin



Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê bi hemû leza xwe berdewam dike û şervanên QSD'ê bi pêşdeçûna xwe didomînin. Li gorî çavkaniyên leşkerî, şervanên QSD'ê 50'î ji sedî xaka bajarokê Hecînê rizgar kirin. Hat ragihandin di şerê ku qewimî de 35 çete hatin kuştin.*R-2*

# GELÊN BAKURÊ SÛRIYÊ LI DIJÎ DAGIRKERIYÊ BÛN YEK




Li dijî gef û êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk bi deh hezaran welatiyên ji hemû pêkhateyan yên Bakurê Sûriyê li bajarên Girê Spî, Serêkaniyê, Kobanê û Qamişlo daketin qadan. Welatiyên Bakurê Sûriyê diyar kirin ku ew êrîşan qebûl nakin û ji dagirkeriyê re gotin na. Welatiyan diyar kirin ku wê ti êrîş nikaribe yekîtiya gelê Sûriyê xirab bike û destketiyên wan têk bibe.

Li dijî gefên dewleta Tirk yên li dijî Bakurê Sûriyê partiyên siyasî yên Rojava yên Kurd jî helwest nîşan dan û xwestin ku her kes li dijî van êrîşan bisekinin. Partiyan bi daxuyaniyan diyar kirin ku ev gefên Tirkiyê ji bo têkbirina projeya biratiya gelan û jiyana hevbeş in. Partiyan got, "Dewleta Tirk dixwaze dagirkeriya xwe li xaka Sûriyê fireh bike." *R-2*

## Rêveberiya Xweser seferberî ragihand




Meclîsa Rêveber a Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dijî gefên êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê seferberî ragihand. Rêveberiya Xweser destnîşan kir ku Erdogan ne tenê herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike hedef di heman demê de êrîşî yekbûna xaka Sûriyê dike. *R-4*

## Em ê li hember planên dagirkeriyê bisekinin



Hevserokê Meclisa Kantona Girê Spî Hemîd El-Ebid teqez kir ku ew nahêlin Tirkiye derbeyê li hevgirtina civakî li herêmê bixe û da zanîn ku ew ê li hemberî planên Tirkiyê bibin yek. El Ebîd got, "Ev ax axa me ye û axa bav û kalên me ye û axa Sûriyê ye, em nahêlin kes axa me dagir bike." *R-4*

## Dewleta Tirk naxwaze teror li Sûriyê biqede



Hevseroka Desteya Rêveber a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyê Foza Yûsif di civîna salane ya Meclisa Kantona Qamişlo de axivî û diyar kir ku dewleta Tirk naxwaze aloziya Sûriyê çareser bibe û got, "Armanca dewleta Tirk ew e ku aloziya Sûriyê kûrtir bibe û temenê çeteyên DAIŞ`ê dirêj bibe." *R-3*

## Li dijî êrîşên dagirkeriyê şoreşa me wê bidome



Saziya Yekîtî û Piştgiriya Gelan (SYPG) bersiv da gefên Serokê rejîma Tirk Erdogan yên li dijî Bakurê Sûriyê û got: "Armanca van êrîşan ji holêrakirina destketiyên Kurdan û gelê herêmê ye. Li dijî êrîşên dewleta Tirk a dagirker şoreşa me wê bidome." SYPG'ê li dijî êrîşên dagirkeriyê bang li gel kir ku li her qadê dakeve kolanan. *R-5*

## Li Tirbespiyê greva birçîbûnê hat destpêkirin




Ji bo piştgiriya parlementera HDP'ê Leyla Guven ku li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan ketiye greva birçîbûnê li Tirbespiyê çalakiya greva birçîbûnê hat destpêkirin. 107 kes tevlî çalakiyê bûne. Di çalakiyê de Endama Rêveberiya Kongreya Star Ayhan Murad axivî û diyar kir ku ew ê li dijî tecrîdê çalaliyên xwe dewam bikin. *R-2*

## Tevî dagirkeriyê jî civaka Êzidî dev ji baweriya xwe berneda



Tevgera Civaka Demokratîk Cejna Êzî li civaka Êzidî û hemû civak û gelên herêmê pîroz kir. TEV-DEM'ê wiha got, "Tevî ku civaka Êzidî bi darê zorê ji Efrînê neçarî koçberiyê bû û xwe li herêmên Şehbayê bi cih kir, lê rê û resmên xwe pêk tînin. Em bi hêvî ne ku ev cejn bibe cejna aştiyê." *R-5*

## Jinên Efrînê dest bi greva birçîbûnê kirin



Kongreya Star a Efrînê li gundê Babinis ê kantona Şehbayê bi armanca şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya çalakiya Leyla Guven, bi dirûşmeya "Em ê girtîgeha Îmraliyê hilweşînin û bi rêber Ocalan re azad bijîn" çalakiya greva birçîbûnê da destpêkirin. 60 jin tev li çalakiyê bûne. Çalakî ew ê 3 rojan berdewam bike. *R-3*

## Xebatên Şaredariya Gel a El-Kesra

Li herêmên ku ji aliyê QSD'ê de ji bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê hatine rizgarkirin xebatên xizmetê û serersatkirinê yên Şaredariyan dewam dikin. Di vê çarçoveyê de Şaredariya bajarokê El-Kesra ya Dêrazorê bi derfetên xwe yên kêm xebatên xizmetê berdewam dike. *R-6*

# Gelê Bakurê Sûriyê li dijî dagirkeriyê daket qadan

**Li dijî gef û êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk bi deh hezaran welatiyên ji hemû pêkhateyan yên Bakurê Sûriyê daketin qadan. Welatiyên Bakurê Sûriyê diyar kirin ku ew êrîşan qebûl nakin û ji dagirkeriyê re gotin na. Welatiyan diyar kirin ku wê ti êrîş nikaribe yekîtiya gelê Sûriyê xirab bike.**

Bi deh hezaran welatiyên ji bajarên Girê Spî, Kobanê, Serêkaniyê û Qamişlo li dijî dagirkeriya dewleta Tirk daketin qadan û helwesta xwe li dijî êrîşan nîşan dan.

### JI DAGIRKERIYÊ RE NA

Bi deh hezaran ji pêkhateyên herêma Qamişlo, ji bo şermezarkirina gefên Erdogan ên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi dirûşmeya "Na ji dagirkeriya Tirkiyê re" li taxa El-Suryan a Qamişlo kom bûn û meşiyan.

Li ser banga seferberiyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi deh hezaran ji pêkhateyên Qamişlo yên Kurd, Ereb û Suryan li taxa El-Suryan a bajarê Qamişlo kom bûn û meşek lidarxistin. Di kombûnê de, pankartên "Na ji dagirkeriya Tirkiyê re", "Na ji Osmaniyeke nû re", "Na ji terora Erdogan re" û "Bijî yekitiya gelên herêmê" hatin rakirin.

Girseya gel dirûşmeyên "Erdogan kujer e", "Em dev ji axa xwe bernadin", "Berxwedan biryara me ye" û "Ji bêdengiya navneteweyî re na" bê navber qêriyan.

Her wiha pêkhateyên Qamişlo ji hemû gelê Kurd hêzên Kurdistanî xwestin ku li hemberî van gefan bibin yek.

### DIXWAZE ÇETEYAN RIZGAR BIKE




Şêniyên kantona Girê Spî bi armanca şermezarkirina gefên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî herêmên Bakurê Sûriyê daketin qadan.

Bi hezaran şêniyên kantona Girê Spî bi armanca pêkanîna banga seferberiyê ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate ragihandin û li dijî gefên Tirkiyê li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê meşek li dar xist. Meşê ji Çerxerêya El-Elem a başûrê bajêr dest pê kir. Di meşê de pankartên bi nivîsên "Pêkhateyên Sûriyê bi yek dengî dibêjin na ji dagirkeriya Tirkiyê re", "Îradeya gelan ji teknîka wan xurttir e", "Li dijî dagirkeriya Tirkiyê serî hildin" û "Em aştiyê dixwazin, şer naxwazin" hatin hildan.

Xwepêşandan li çerxerêya taxa El-Îskan veguherî mitîngê. Di mitîngê de cîgirê Hevserokatiya Meclisa Kantona Girê Spî Sebrî Mistefa axivî û destnîşan kir ku ew ê bi yekitiya xwe li dijî gefên Erdogan bisekinin, ji ber ku gelên herêmê ji destpêkê ve bi hev re dijîn û Erdogan nikare yekitiya wan ji hev bixe. Mistefa diyar kir ku şervanên QSD`ê ber bi rizgarkirina beregehên dawîn ên çeteyên DAIŞ`ê ve diçin, Erdoganê faşîst dest bi gefên li ser herêmê kir û armanca wî ji vê yekê ew e ku zextê li ser çeteyan kêm bike.

### GEF NIKARIN ÎRADEYA ME BIŞKÎNIN

Pêkhateyên Serêkaniyê meşek li dijî gefên serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyîp Erdogan ên li dijî Bakurê Sûriyê li dar xist û bêdengiya navdewletî şermezar kir.

Piştî ku serokkomarê Tirkiyeyê Recep Tayyîp Erdogan roja 12'ê mehê diyar kir ku ew ê di nava çend rojan de êrîşî herêmên Bakurê Sûriyê bikin, hemû pêkhateyên Serêkaniyê meşek li dar xist.

Gelê Serêkaniyê û Zirganê bi alên YPG/YPJ'ê, posterên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, alên QSD'ê ji ber avahiya Mala Gel a Serêkaniyê heta Çerxerêya Şehîdan meşiyan. Di meşê de pankartên "Em êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk ên li ser Rojava şermezar dikin" û "Tevahiya gelê Kurd û gelên azadîxwaz ji dagirkeriya Erdogan re dibêjin NA" hatin bilindkirin.

Li Çerxerêya Şehîdan, meş veguherî mîtîngê û hevserokê meclisa herêma Serêkaniyê Loqman Îso axivî û wiha got: "Em îro û her wext bi hamû pêkhateyên xwe li hember êrîşên dagirkeriya Erdogan amade ne. Em ê hert im li ber xwe bidin."

Îso anî ziman ku tu gef nikarin îradeya wan bişikînin û wan ji bajarê xwe derxin, wê heta dawiyê li ber xwe bidin û serê xwe natewînin.

Meş bi siloganên "Bijî berxwedana Rojava" û "Dîsa dîsa berxwedan" bi dawî bû.

## Greva birçîbûnê ya li Kobanê berdewam dike



Çalakiya greva birçîbûnê ya ji bo şermezarkirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di roja xwe ya 4`emîn de li bajarê Kobanê didome.

Di 10`ê Kanûnê de konê greva birçîbûnê ji bo şermezarkirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya hevseroka KCD`ê Leyla Guvan ku di zindana Amedê de ketiye greva birçîbûnê, li bajarê Kobanê hat vedan.

Hemû pêkahateyên herêma Firatê berê xwe didin konê greva birçîbûnê. Di roja 4`emîn de jî çalakiyê bi helbest û axaftinan dewam kir.

Yek ji pêkhateyên Ereb ji navçeya Sirînê Fîrdos Kino ku di bin kon de bû, bal kişand ser biratiya gelan û wiha got: "Serok Apo jin azad kirin, armanca me jî azadkirina wî ye. Em ê her li ber xwe bidin ta ku serok azad dibe. Me biryara azadkirina rêberê xwe daye û ji vê biryarê tu car venagerin."…*ANHA*

## Li Tirbespiyê greva birçîbûnê hat destpêkirin



Bi sedan welatiyên navçeya Tirbespiyê ji bo piştgiriya daxwazên Leyla Guven û rakirina tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tev li greva birçîbûnê bûn.

Kongreya Star û Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) li navçeya Tirbespiyê greva birçîbûnê ji bo piştgiriya hevseroka KCD`ê û parlamentera HDP`ê ya Culemêrgê Leyla Guven li dar xist. Di seatên sibehê de bi sedan şêniyên navçeyê ji Kurd, Ereb û Suryanan berê xwe da konê grevê.

Di çalakiyê de, Endama rêveberiya Kongreya Star Ayhan Murad axivî û wiha got: "Kombûna şêniyên navçeya Tirbespiyê ji bo şikandina tecrîda girankirî li ser rêber Ocalan, bersiva rast ji gefên Erdogan re ye."

Ayhan diyar kir ku çalakiya Leyla Guven li hemberî dewleta Tirk a dagirker, berxwedaneke mezin e û daxwaza Leyla Guvan daxwaza hemû gelan e. Ayhan wiha dewam kir: "Leyla Guven bi rêya berxwedana xwe di zindana dagirkeran de, berxwedana jina azad ku dagirkeriyê qebûl nake, nîşan da. Em jî vê çalakiyê erê dikin û piştgiriya xwe bi wê re nîşan didin."

Çalakiya grevê bi beşdarbûna welatiyan dewam dike û hejmara kesên ku ketine grevê 107 kes e. Her wiha partiyên siyasî û saziyên sivîl berê xwe didin konê grevê.

## Nîvê Hecînê hat rizgarkirin

Şervanên QSD'ê bajarokê Hecîn ya Dêra Zorê 50'î ji sedî rizgar kir.


Li gorî çavkaniyên leşkerî, şervanên QSD'ê yê di Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê ya li Dêra Zorê li dijî çeteyên DAÎŞ'ê şer dikin de cih digirin, 50'î ji sedî xaka bajarokê Hecînê rizgar kirin.

Di şerê hê dom dike de 35 çete hatin kuştin. Çavkaniyê anî ziman ku çeteyên DAÎŞ'ê ji bo pêşveçûna şervanan bidin rawestandin bi wesayîtên bombebarkirî êrîşî nûqteyên şervanan kirin, şevanên QSD'ê 4 wesayîtên bombebarkirî bê ku bihihêjin hedefên xwe teqandin.



Şerê li herêmê hê dewam e, pêşveçûna şeravnan li bakurê rojavayê Hecînê dewam dike.

## Fermandarekî leşkerên Tirk hate kuştin



HPG'ê diyar kir, li herêma Girê Korê ya Îdirê li yekîneyên veşartî yên artêşa Tirk hatiye xistin û di encamê de fermandarê yekîneyê hatiye kuştin. Her wiha li heman herêmê li wesayiteke leşkerî ya bi tîpa Cemse hate xistin.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiya gerîla ya li Îdirê daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Di daxuyaniyê de hate ragihandin, artêşa Tirk a dagirker ev demeke li herêma Girê Korê a Îdirê bi yekîneyên veşartî operasyonê dike.

Li gorî daxuyaniya HPG'ê, di çarçoveya Pêngava Serketina Şoreşgerî de ya li Eyaleta Serhedê dewam dike, êvara 11'ê Kanûnê saet 21'ê li qada Girê Sitîla yê heman herêmê li dijî yekîneyên veşartî çalakiyek hatiye lidarxistin.

Di daxuyaniyê de hate gotin, "Derbên giran li çeperên dijmin hatin xistin û di encamê de fermandarê yekîneyê hate kuştin, gelek leşker jî birîndar bûn. Hejmara zelal nehate tespîtkirin."

Di dewama daxuyaniyê de hate ragihandin, hêzên HPG'ê li wesayiteke leşkerî ya bi tîpa Cemse xistine ku hewl dida mudaxleyî qada çalakiyê bike.

Hate gotin ku derb li wesayitê hatiye xistin, lê hejmara leşkerên Tirk ên mirî û birîndar nehatiye zelalkirin."



# Em bi hev re xwedî li Kurdî derkevin

**Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, ku 18'ê Nîsana 1992'an de ji aliyê hêjmareke zêde rewşenbîran de ava bû, Kanûna 2016'an ji aliyê rejîma AKP'ê ve hate girtin. Komeleya Lêkolînên Kurdî ku sala 2017'an ava bû, ji aliyekî ve perwerdeya bi Kurdî dide, li aliyê din li ser ziman û dîrokê lêkolînên zanistî dike. Komeleyê bang li gelê Kurd kir ku xwedî li zimanê xwe derkeve.**





Komeleya Lêkolînên Kurdî ku sala 2017'an ava bû, ji aliyekî ve perwerdeya bi Kurdî dide, li aliyê din li ser ziman û dîrokê lêkolînên zanistî dike. Komeleyê bang li gelê Kurd kir ku xwedî li zimanê xwe derkeve.

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, ku 18'ê Nîsana 1992'an ji aliyê Mûsa Anter, Feqî Huseyîn Sagniç, Îsmaîl Beşîkçî, Abdûrrahman Durre, Îbrahîm Gurbuz, Cemşîd Bender, Suleyman Înanoglû, Yaşar Kaya û gelek rewşenbîrên din ên Kurd ve hate damezrandin, Kanûna 2016'an ji aliyê rejîma AKP'ê ve hate girtin. Ji bo dagirtina vê valahiyê, Adara 2017'an Komeleya Lêkolînên Kurdî ava bû. Ji hingî ve li ser ziman, çand û wêjeya Kurdî lêkolînan dike û hewl dide piştî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê vî karî bidomîne. Endamên Desteya Rêveber Sîpan Haco û Eyyup Sûbaşi li ser karê xwe axivîn.

### ME HEWL DAN VALAHIYA ENSTÎTUYÊ DAGIRIN

Sîpan Haco diyar kir ku Komeleya Lêkolînên Kurdî bi mîsyona temamkirina karê Enstîtıya Kurdî ya Stenbolê rabûye û got, "Ji sala 1992'an û vir ve li ser mijarên wêje, ziman û dîrokê karekî cidî û bingeheke xurt hebû li Stenbolê. Piştî ku enstîtu hate girtin, valahiyek çêbû. Me xwest vê valahiyê dagirin û bi vê wesîleyê me hewl dan Komeleya Lêkolînên Kurd ava bikin. Adara 2017'an me bi rengekî fermî komeleya xwe ava kir. Ji hingî ve karê me dewam dike."

Haco anî ziman, ku ew bi giranî perwerdeya bi Kurdî didin, materyalên di vî warî de amade dikin, li ser dîrok û wêjeya Kurdî hem berhemên nivîskî hem jî yên devkî lêkolîn dikin.

Haco diyar kir, perwerdeya li Komeleya Lêkolînên Kurdî salê sê heyam e û got, "Di perwerdeyên me de 5 kurs hene ku yek ji wan kursa mamostetiyê ye... Salê bi qasî 200-300 kes tevlî kursan dibin. Ji ber pêvajoya heyî tevlîbûna niha hinekî kêm e. Bi giranî bi zaravayên Kurmancî û Zazakî atolyeyên me yên ziman hene. Perwerdeyên me yên bi van zaravayan heta asta herî bilind tên dayin. Wekî din, me yekemcar atolyekeke xwe bi zaravayê Soranî vekir. Di perwerdeya xwe de bêguman me mîrateya Enstîtuya Kurd a Stenbolê dewr girt. Em materyalên wan bi kar tînin ku ew materyal bi demê de di dibistanên dewletê de, di dersên hilbijartî yên Kurdî de jî weke referans hatin nîşandan."

### STATUYA GEL Û ZIMAN

Sîpan Haco got, di mijara pêşvebirina ziman an jî perwerdeyê de saziyên bi vî rengî bi tena serê xwe têrker nînin û wiha dewam kir: "Ji bo lêkolîneke zanistî ya li ser wêje û dîroka gelekî, pêwîstî bi bingeheke xurt heye. Beriya her tiştî divê ew gel û zimanê wî gelî xwedî statuyekê be. Zimanê Dayikê şertê ewilî ye. Eger ev bibe wê hingî ziman ji asîmîlasyon û metirsiya tinebûnê rizgar bibe. Li Tirkiyeyê niha ev şert nîne. Tenê saziyên ziman hene. Hevalên di vî warî de dixebitin bi ked û fedakariya xwe hewl didin Kurdî bi pêş ve bibin. Bêguman ev têrê nake. Beriya her tiştî li qada siyasî kêmasiyên cidî hene. Ti ji rêxistinên siyasî li ser ziman projeyeke xwe nîne û mixabin karekî di vî warî de nakin. Ev bar tenê li ser saziyên ziman dimîne. Divê ev kêmasî çareser bibe."

Haco bal kişand ser bandora neyînî ya Rewşa Awarte ya li ser saziyên ziman û got, "Bi rabûna Rewşa Awarte re kursên nû yên ziman vebûn. Li Îzmîr, Wan, Êlih, Amedê vebûn. Hêvîdar im wê li cihên din jî mîna berê vebe."

### DIVÊ ZIMAN LI HER QADÊ BÊ BIKARANÎN

Eyyup Sûbaşi jî diyar kir ku divê ew ji perspektîfeke giştî li mijara pêşvebirina Kurdî binerin û got, "Ji bo pêşvebirina ziman, 10 an jî 20 kovar bên derxistin jî bi têra xwe tesîrê nake. Beriya her tiştî divê Kurdî bibe zimanê perwerdeyê. Li dibistanan û li zanîngehan bê bikaranîn. Karê ku em dikin ji bo dema dirêj ziman bi pêş ve nabe, tenê bingehê datîne. Ji bo zimanek karibe bi pêş bikeve, divê li her qadê hebe. Mînak; divê qenalên televîzyonê hebin, ji rêze-fîlman heta fîlman, divê weşaneke xurt pê were kirin. Li zanîngehan jî divê bi vî rengî be. Bêguman em li vir 3 heyaman kursê didin û hewl didin tevkariyê bikin. Lê belê bi van dersan ancax salê 500 kes bê perwerdekirin. Li Tirkiyeyê 25-30 milyon Kurd hene. Lewma derfetên me kêm in. Eger tenê bi vî karê em dikin em rabin bêjin ku em ê Kurdî wiha bi pêş bixin, ev ê bibe neheqî li Kurdî. Ev yek tenê bingeheke ji bo karên siberojê."

### ZIMAN JI BO ME HER TIŞT E

Sûbaşi destnîşan kir ku karên bingehîn ên Komeleya Lêkolînên Kurdî, ya jî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê divê bên dîtin û got, "Ji ber ku ziman ji bo me her tişt e. Eger zimanê me jî ji dest biçe, hingî tiştek namîne, asîmîlasyon wê bi ser bikeve. Em xwe heta cihekî diparêzin. Lê belê Kurdî ne tenê zimanekî axaftina rojane ye. Eger zimanek tenê weke zimanekî axaftina rojane bê dîtin, ev ê bibe neheqiyeke mezin li wî zimanî. Ji xwe polîtîkayên niha tên meşandin jî bi vê armancê ne."

Sîpan Haco herî dawî bi bîr xist ku polîtîkayên asîmîlasyonê dewam dikin û got, "Ji bo em karibin van polîtîkayan bişikînin, divê em xwedî li zimanê xwe derkevin û fedakariyê bikin. Ji ber vê yekê em li benda desteka Kurdên li Stenbolê ne. Bila werin tevlî perwerdeyên me bibin. Eger em bi hev re xwedî li Kurdî derkevin, em ê wê çaxê karibin bi pêş bixin."…*ANF*

## Divê hunermendên Kurd projeyên hevbeş pêşbixin



Hunermend Ednan Kerîm diyar kir ku yekgirtin û qebûlkirina cudahiyan pêşketinê ji bo civakê çêdike û got, "Eger hunermendên herçar parçên Kurdistanê bi hev re kar bikin, wê di milê hunerî de jî pêşketinên mezin çêbibin."

Hunermendê Kurd Ednan Kerîm derbarê yekîtiya neteweyî de ku yek ji xwestekên gelên Kurd e axivî û got: "Li gorî min gelek girînge ku hunermendên herçar parçên Kurdistanê bikarin projeyên xwe bikin yek. Wê demê wê bikarin di warê hunera Kurdî de pêşketinên mezin çêkin."

Ednan Kerîm diyar kir ku di nava civakê de hevdû qebûlkirin girînge û wiha dewam kir; "Me çend kar kirine ku hunermendên harçar parçeyên Kurdistanê beşdar bûne. Bi nimûne bûne gavekî nû ji bo komkirina hestên hunermendan û karên hunerî yên xweşik. Eger em bikarin hevdû bigirin û raman û fikrên hevdu qebûl bikin, bêguman li herçar parçeyên Kurdistanê wê welat pêş bikeve. Lewma pêwîstiya me bi vê yekgirtinê heye."…*ROJNEWS*

## Li ser Berxwedana Serdemê kurtefilm hatin nîşandan



Li Navenda Çand û Hunerê ya Waşûkanî ya bajarê Serêkaniyê 6 kurtefilm hatin pêşandan.

Komîna Film a Rojava bi hevkariya Çand û Hunerê ya Serêkaniyê, 12 Kanûnê danê êvarê li Navenda Çand û Hunerê ya Waşûkanî kurtefilmên "Zeytûn Ciminra, Aras, Afrînerên Hêviyê, û Çavên Rêwî" dane pêşandan.

Bi dehan welatiyên bajarê Serêkaniyê ji bo temaşekirinê berê xwe dane navendê. Navaroka kurtefiliman li ser berxwedana gelê Efrînê bûn.

Derhêner û Hevserokê Komîna Film a Rojava Mihyedîn Ebdullselam derbarê filman de wiha got: "Ev proje bi navê duderî hat naskirin, duderî bi xwe şkefteke li Efirînê ye hestiyên mirovên herî kevnar li wir hatine dîtin."

Ebdullselam da zanîn ku piştî li Dêrikê û Zanîngeha Rojava kurtefilm hatin pêşandan, li Serêkaniyê hatin pêşandan.

Ebdullselam destnîşan kir ku wê kurtefilm li Til Temir, Rimêlan û li Amûdê û Helebê jî werin pêşandan…*ANHA*

## Pêşandana Filmê 14'ê Tîrmehê hefteyeke din jî hate dirêjkirin



Li Silêmaniyê ji ber xwesteka zêde ya xwendekar û ciwanan a ji bo temaşekirinê Filmê 14'ê Tîrmehê ya li ser berxwedana pêşengên PKK'ê yên li Girtîgeha Amedê hefteyek din hate dirêjkirin.

Li Sînemaya Salim a li Silêmaniyê ji 1'ê Kanûnê ve filmê 14'ê Tîrmehê ku naveroka wê li ser berxwedan û têkoşîna pêşengên PKK'ê û girtiyên siyasî yên li Girtîgeha Amedê ye, dihate pêşandan. Lê, ji ber xwesteka zêde ya xwendekar û ciwanênan a temaşekirina film wê hefteyeke din jî li Sînemaya Salim Filmê 14'ê Tîrmehê were pêşandan.

Rêberiya Sînemaya Salim biryar da ku di hefteya sêyemîn de li ser daxwaza xwendekar û ciwanan ji roja 15'ê Kanûnê ve di saet 13.00'an de ji bo xwendekaran û ciwanan û di saet 19.00'an de jî ji bo malbatan were pêşandan.

Li gorî Rêveberiya Sînemaya Salim xwestekî zêde ya temaşekirina film heye…*ROJNEWS*

**Li herêmên ku ji aliyê QSD'ê de ji bin dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê hatine rizgarkirin xebatên xizmetê û serersatkirinê yên Şaredariyan dewam dikin. Di vê çarçoveyê de Şaredariya bajarokê El-Kesra ya Dêrazorê bi derfetên xwe yên kêm xebatên xizmetê berdewam dike.**





# Xebatên Şaredariya Gel a El-Kesra

Şaredariya bajarokê El-Kesra ya Dêrazorê bi derfetên xwe yên kêm xebatên xizmetê berdewam dike.
Şaredariya El-Kesra bi hemû derfetên xwe hewl dide li gundên El-Hermûşiyê û El-Ziêr ên Dêrazorê ku xerabûne sererast bike.
Karkerên Şaredariyê dest bi hemleya rengînkirina resîfan û amûrên kehrebeyê û çerxereyên li bajêr û deriyên dikanan kirin.
Şaredariyê li deriyê veguhestin û derketina bajarok 4 peykerên ku girîngiya dîrokî ya herêmê diyar dikin, danîn. Her wiha şaredariyê hemû rêyên xirabûyî yên ber bi bajarokê El-Kesra ve bi dirêjbûna 10 kîlometreyan sererast kirin.
Her wiha 5 çerxerê ji nû ve sererast kirin (çerxerêya bakurê bajarok, çerxerêya sereke li navenda bajêr, çerxerêya gundê Hîmar El-Kesra, çerxerêya şaredariyê û çerxereya Meclisa Sivîl). Her wiha 200 dar hatin çandin.
Endamên çavdêriya zimhêrê rojane di nava sûk û dikanên bazirganiyê de digerin, armanc jê ku madeyên xerab bûne û demborî û goştê xerab desteser bikin. Li gorî çavdêran rêjeya qûtê demborî ji sedî 90 daketiye.
Hevserokê Şaredariya Gel a El-Kesra Xiyas El-Ecîl wiha got: "Ji destpêka avakirina şaredariyê ve me bi hemû derfetan dest bi kar kir. Me hemû serpêçî ku ji ber tevliheviyê û rûxandinê pêk hatibûn, dan sekinandin. Em soz didin gelê xwe em ê di pêşerojê de kar bêhtir bikin."…*ANHA*



# Projeya xwedîkirina sewalan li Dêrikê

Li Bakurê Sûriyê taybet Rojava bi dewlemendiya çandiniyî û kedîkirina sewlana tê naskirin û aboriya xwe ser vê bingehê pêşdixin. Bi armanca ku aboriya herêmê ya komînal her geş û pêşkeve û derfetên kar avabikin, Mala Koopertîfan ya milê Dêrikê ya girêdayî Kantona Qamişlo hewldanên zêdekirina projeyên aborî dike.

### DUYEMÎN PROJEYA KEDÎKİRİNA SEWALAN Lİ DÊRİKÊ

Mala Kooperatîfan ku beriya du salan li gundê xana Meşkê ya girêdayî Koçerata li Dêrikê dest bi projeyên kedîkirina sewalan kiribûn. Ku di ev projeya 288 serî pez heye û ev duyemîn projeya kooperatîfa kedîkirina sewala li Herêma Dêrikê tê avakirin. Ev projeya jî wekî Mala Kooperatîfan bi rêvedibin, bi mebesta ji projeyên kooperatîfan ku aboriyek komînal di civakê de avabikin, her wiha derfetên kar ji welatiyan re avadibe. Di heman demê de jî ji wan pezan wekî goşt, hirî û şîr sûd digrin û li bazrên herêmê difiroşin.

### 106 MİYÊN BİÇÛK Jİ DAYÎK BÛN


Ev projeya ku beriya du salan hatibû destpêkirin bi hemû beşên xwe bi dawî bû. Proje ji 4 hingaran pêk tê û rûbariya her hingarekê 2.metreye, her wiha her hingrek têra 100 serî pez dike. Di heman demê de jî depoya ji bo elfên sewlan û xaniyek ji bo şivanê pez hatiye avakirin, her wiha bîrek nêzî hingran hatiye kolandin û elektirîk jî hate vedan ku bi giştî 288 serî pez niha di bxçedeyê anjî projeya kedîkirina sewlan deye. Ku di destpêka meha Cotmehê de 106 miyên biçûk jidayîk bûn,ew şivanê ku hatiye erkdarkirin guhdanê li wan miyên biçûk dike, her wiha jî bijîjkê beyterî çavdêriya hemû pez taybet miyên biçûk dike da ku wan ji nexwşiyan bi parêze û derman bike.
Di depoya ku ji bo pez Hatiye avkirin 90390 ton pûş û gelek ton ji ceh jî, wekî elefên sewlan ji bo demsala çile li wê depoyê bi cih kirine.
***Ronahî/Dêrik***

# Kesên mazot wernegirtine bila serî li komînan bidin



Li ser daxwazên şêniyan ku mazot wernegirtine, komîteyên xizmetguzariyê yên komînên Qamişlo dest bi belavkirina beşa sêyemîn a mazotê li şêniyên ku mazot wernegirtine kir.
Bi hatina zivistanê re komîteyên xizmetguzariyê bi hevkarî û koordîneya şaredariyên gel ên Qamişlo dest bi belavkirina mazotê li welatiyan, li ser du beşan kirin.
Komîteyan di her du beşan de li her malbatekê 200 lître mazot belav kir.
Piştî bidawîbûna xebatên belavkirina her du beşan li herêma Qamişlo, hejmarek şêniyên herêmê ji komînan re diyar kirin ku wan mazot wernegirtiye.
Li ser wê komîteyên xizmetguzariyê dest bi tomarkirina navên şêniyên kir ku mazot wernegirtine da ku mazotê li wan belav bikin.
Girêdayî mijarê Hevserokê Komîna Şehîd Amêr ê taxa El-Bişêriyê Nesredîn Ebdulerehman El-Mele diyar kir ku komîn ji 160 malbatan pêk tê û mazot li 150 malbatan di her du beşan de hatiye belavkirin. Her wiha destnîşan kir ku 10 malbatên mayî ku mazot wernegirtine, ji ber ku hîna mazota sala borî li gel wan hebû.
Nesirdîn xuya kir ku ew 10 malbatên ku mazot wernegirtine daxwaznameyek girêdayî hewcedariya wan bi mazotê ji komînê re pêşkêş kirine. Piştre wan bi komîteyên xizmetguzariyê re koordîne kirine û ji aliyê xwe ve komîteyê mazot li wan malbatan belav kir.
Di dawiyê de El-Mele bang li hemû şêniyan kir ku kesên mazot wernegirtine bila serî li komînê bidin…*ANHA*

## RAMANÊ RÊBERTIYÊ



### Rastiya Kurd -3-

**Abdulah Ocalan**

Bi awayekî giştî têkoşîna civakî têkiliya xwe bi lêgerîna heqîqetê heye. Çi têkoşîn dibe bila bibe, wexta bixwaze pirsgirêkeke civakî çareser bike, eger heqîqeta civakî îfade neke nikare bi ser keve. Ji ber ku heqîqeta civakî îzafî ye, gelekî xisletên wê yên kategorîk hene. Têkiliya xwe gelekî bi zeman û mekan re heye. Dema mirov di çarçoveya heqîqetê de binirxîne, PKK'ê hebûna Kurd a li ber tesfiyeyê, ne bi tenê îspat kir, bi giranî wê heyî jî kir. Jixwe bi awayekî klasîk tevgera rizgariya neteweyî nedimeşiya. Ne rewşa hebûnê ya xwe disipartê, ne jî serwextî û bîrbirina heyî têra vê yekê dikir. PKK'ê weke çalakî Kurd kir heyî. Kurdîtiya di sedsala 20. de, Kurdîtiyeke wisa bû, divê berê bibe heyî û paşê bê rizgarkirin. Ya PKK têde bi ser ketibû ew bû, Kurd kiribûn heyî. Eger tiştek pirsgirêka xwe ya hebûnê hebe, berê pêşî divê mirov ne ku wî tiştî rizgar bike, wî bike heyî. Bi temamî rewşa Kurdan ew bû ku diviyabû mirov wan bike hebûn. Têgînên mîna rizgarî, azadî û wekheviyê ji bo hebûnên pirsgirêka xwe ya heyînê çareserkirine maneyekê îfade dikin. Çalakgeriya PKK'ê ji aliyê xwe yê rizgarkeriyê zêdetir, aliyê xwe yê rê li ber heyînê vedike gelekî girîng e. Tevî hemû kêmûkurtiyên xwe yên di warê avahî û serwextbûnê de jî ji sedî sed PKK ji bo Kurdan bike heyîn bi roleke heyatî rabûye. Ev pirs girîng e: Gelo bêyî çalakgeriya PKKê hebûna Kurdan dikarîbû bibûya xwediyê rewşa xwe ya heyî? Zehmet e ku mirov ji vê pirsê re bibêje, erê.
Berî ku em pirsgirêka Kurd û rêyên çareseriyê guftûgo bikin, şert e ku em xwe di mijara hebûnê de zelal bikin. Mebesta me ji zelalkirinê ew e, em di mijara hebûna pêwendîdar de bi heqîqetê re rûbirû bibin û wê nas bikin. Heqîqet jî hedefeke wisa ye ku mirov ji bo wê têkoşîneke mezin nemeşîne nikare xwe bigihîniyê. Heqîqet ne rastî ye, ew rewş e ku mirov li rastiyê serwext dibe û bîra wê dibe. Rastiya bêheqîqet, rastiya razayî ye. Rastiya razayî jî pirsgirêka xwe tineye. Heqîqet ew rewşa rastiyê ye ku ji xewê hatiye hişyarkirin. Rewşa Kurdan a xewê ewqasî kûr û nêzî mirinê bû, eşkere bû ku şerê ji bo heqîqeta wê gelekî tevlîhev û zehmet bûya. Piştî rewşa xwe ya sîhûpênc sal berê, berê xwe didim heqîqeta gelê Kurd (tevî hemû şert û mercên giran ên Girtîgeha Îmraliyê ji arezû û heyecana xwe min tiştek kêm nekirî), ev yek ji rola wan a rohnîker a di dema şeveqa şaristaniyê de gelekî manedar mîna rohniyê dide biharekê. Haya min ji min heye ku ez bi awayekî romantîk li mijarê temaşe dikim. Bi awayekî romantîk nêrîn, bi herhalî ji nêrîna îronîk a heqîqeta bûye xwelî û ti hêviyê nade, bêhtir bang li mirov dike û vedixwîne ew heqîqeta ku hê zîlên teze ye. Heqîqetên der barê rastiya Kurd û pirsgirêka wî de cara pêşî ye ku li pêkhatina hêviyên azadiyê şahidiyê dikin.



# Jinên Efrînê dest bi greva birçîbûnê kirin

**Kongreya Star a Efrînê li gundê Babinis ê kantona Şehbayê bi armanca şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya çalakiya Leyla Guven, bi dirûşmeya "Em ê girtîgeha Îmraliyê hilweşînin û bi rêber Ocalan re azad bijîn" çalakiya greva birçîbûnê da destpêkirin. 60 jin tev li çalakiyê bûne. Çalakî ew ê 3 rojan berdewam bike.**

Kongreya Star li Şehbayê bi armanca şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya çalakiya Leyla Guven çalakiya greva birçîbûnê destpêkir.
Kongreya Star a Efrînê li gundê Babinis ê kantona Şehbayê bi armanca şermezarkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya çalakiya Leyla Guven, bi dirûşmeya "Em ê girtîgeha Îmraliyê hilweşînin û bi rêber Ocalan re azad bijîn" çalakiya greva birçîbûnê da destpêkirin. 60 jin tev li çalakiyê bûne. Çalakî dê 3 rojan berdewam bike.
Cihê çalakiyê bi wêneyên şehîdên Berxwedana Serdemê, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, wêneyên parlementera HDP'ê Leyla Guven, pankartên bi nivîsên "Azadiya Ocalan azadiya hemû gelan e" hate xemilandin.
Endamên Yekitiya Jinên Êzidî, Tevgera Jinên Ciwan û bi dehan şêniyên herêmê tev li çalakiyê bûn.



Di çalakiyê de endama Koordînasyona Kongreya Star a kantona Efrînê Newroz Haşim axivî û destnîşan kir ku jinên Efrînê di qonaxa duyemîn a Berxwedana Serdemê de piştgiriyê didin çalakiya Leyla Guven û berxwedana wê di girtîgeha Amedê de û silav li sekna wê ya li dijî dewleta Tirk a dagirker dikin.
Newroz diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker tu carî nikare îradeya gelê Kurd û têkoşîna wan ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bişikîne. Di dawiyê de Newroz diyar kir ku ew ê têkoşîna xwe heta bidawîkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan berdewam bikin.
Paşê ji aliyê endamên Meclisa Malbatên Şehîdan Hacer Miho û Sûreya Hebeş, bi navê Kongreya Star a navçeya Ehdasê Hesna Hesen ve axaftin hatin kirin. Di axaftinan de hate diyarkirin ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo azadiya gelan tê dikoşe û rola jinan di nava civaka de sereke ye û wiha hate gotin: "Divê hemû jin rola xwe ya sereke di nava civakê de bilîzin û têkoşîna xwe ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û rakirina tecrdîkirina wî xurt bikin."
Her wiha di axaftinan de bêdengiya navdewletî û rêxistinên mafên mirovan der barê siyaseta dewleta Tirk a dagirkr li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û gelê Bakurê Sûriyê de hate şermezarkirin…*ANHA*

# Li dijî tecrîdê em ê asta têkoşîna xwe bilind bikin

Jinên kantona Efrînê yên li Şehbayê, piştgiriya xwe ji bo daxwazên Leyla Guven anîn ziman û diyar kirin ku ew ê asta têkoşîna xwe bilind bikin.
Bi armanca şermezarkirina tecrîda giran ku dewleta Tirk li Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan ferz kiriye, çalakiya greva birçîbûnê ya parlamentera Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) yê bakurê Kurdistanê Leyla Guven, li girtîgehê dewam dike.
Jinên Efrînê ku li Şehbayê bi cih bûne, piştgirî dan daxwazên Leyla Guven.
Jina bi navê Fîdan Fayiq destnîşan kir ku êrîşên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li dijî herêmê ji destpêka şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyê de dewam dike, dagirkirina Efrînê û girtina siyasetmedarên Kurd li Tirkiyê, di çarçoveya berdewamkirina komploya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de pêk tên. Fîdan wiha dewam kir: "Dewleta Tirk ji êrîş û kiryarên xwe armanc dike ku bala gelê Kurd ji tecrîda li Rêber Ocalan, dûr bixe. Lê helwesta Leyla Guven û piştgiriya welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û gelê Kurd li tevahiya Kurdistanê ya ji bo daxwazên Leylayê re, bersiva hemû planên dewleta Tirk a dagirker e."
Jina bi navê Fatma Cemîl jî diyar kir ku daxwazên Leyla Guven, daxwazên gelê Kurd in û li ser vê bingehê wê têkoşîna xwe heta rakirina tecrîdê bilind bikin. Fatme Cemîl bang li hemû rêxistinên navdewletî û gelên cîhanê kir ku kiryarên Tirkiyê yên li dijî siyasetmedar û kesên azadîxwaz bi dawî bikin.







Jina bi navê Zeyneb Hebeş jî destnîşan kir ku dewleta Tirk dewletek e ku mafên mirovan bin bê dike û bang li hemû cîhanê kir ku mudaxeleyî dewleta Tirk bikin, tecrîdê bi dawî bikin…
*ANHA*

# Dewleta Tirk naxwaze teror li Sûriyê biqede

Hevseroka Desteya Rêveber a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyê Foza Yûsif diyar kir ku dewleta Tirk naxwaze aloziya Sûriyê çareser bibe lê belê armanca wê ew e ku alozî kûrtir bibe û temenê çeteyên DAIŞ`ê dirêj bibe.
Hevseroka Desteya Rêveber a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyê Foza Yûsif di civîna salane ya Meclisa Kantona Qamişlo ya li bajaroka Rimêlanê pêk hat de axivî.
Foza Yûsif li ser rewşa herêmê, Sûriyê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê destnîşan kir ku ji ber nebûna îradeya gel û desthilatdariya sîstemên qewmî û desthilatdar li herêma Rojhilata Navîn alozî heye û ji ber wê sedsala 20`an li herêmê bûye sedsala şer.
Foza Yûsif destnîşan kir ku di nava çend salan de gelek pêşketinên girîng li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di aliyê xurtkirina demokrasiyê û îradeya gelan di rêvebirina karûbarên wan de çêbûn.
Foza Yûsif wiha dewam kir: "Cara yekemîn di dîroka herêmê de gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi îradeya xwe ya azad dûrî destwerdanên derve nêrînên xwe diyar kirin. Sala derbasbûyî hilbijartinên demokratîk hatin lidarxistin.Tecrubeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê tecrebeyeke cuda ye. Li şûna sîstemên desthilatdar ên heyî bûye mînak. Ji ber hêzên paşverû ne razî ne. Hêzên ku baweriya wan bi îradeya gelan nayê vê mînakê xetere dibînin. Hewl dide sîstemeke merkezî û desthilatdar ava bike û li ser pêşeroja herêmê ferz bike."
Foza destnîşan kir ku hêzên siyasî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hewl didin bi şêwazên aştiyane aloziya Sûriyê çareser bikin û diyar kir ku ew naxwazin tu pirsgirêk bi şêwazên leşkerî çareser bikin. Foza da zanîn ku pêwîstiya wan her tim bi çareseriyên aştiyane û demokratîk heye lê hêzên paşverû yên mîna Tirkiye, Îran û rêjîma



Sûriyê naxwazin pirsgirêkan çareser bikin.
Foza Yûsif der barê gefên dewleta Tirk a dagirker û êrîşên wê li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de wiha anî ziman: "Sala 2018`an ji mijarên ku em ji bo wê xebitîn ku aramî û ewlehî li Sûriyê pêk were û çeteyên DAIŞ`ê tune bibin. Lê dewleta Tirk a dagirker û Rûsya ev yek xetere li ser xwe dîtin. Ji bo ku me bikişînin nava şer êrîşî Efrînê kirin. Armanca me ew e ku tecrûbeya Bakurê Sûriyê bibe mînaka çareseriya aloziya Sûriyê."
Foza Yûsif destnîşan kir ku armanca dewleta Tirk a dagirker ew e ku Sûriyê parçe bike, aloziya Sûriyê çareser nebe…*ANHA*

# Tecrîd pirsgirêkan kûrtir dike



Rêvebira Şaredariya Bajarê Serêkaniyê Nesrîn Selah destnîşan kir ku bi tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hemû civak tên tecrîdkirin û wiha got: "Tecrîd ne çareserî ye. Berovajî vê pirsgirêkan kûrtir dike. Divê tecrîd demildest bi dawî bibe."
Nerazîbûnên li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dikin. Rêvebira Şaredariya Bajarê Serêkaniyê Nesrîn Selah diyar kir ku tecrîda giran a li ser Rêber Abdullah Ocalan ne tenê bi destên Tirkiyê bi destên hêzên navneteweyî jî pêk tê û wiha got: "Armanca tecrîdkirina Rêber Apo ew e ku tenê ji berjewendiyên hêzên navneteweyî re xizmet bê kirine."
Nesrînê got: "Dixwazin bi tecrîdê fikir û ramanên Rêberê me bidin jibîrkirin û koasa ku heye kûrtir bikin. Rêber Apo îradeya milyonan e. Îradeya milyonan nikare bê tecrîdkirin. Rêberê me bi hewldan û fikrên xwe azadiya hemû cîhanê dixwaze. Yekî ku ji bo azadiya hemû cîhanê hewl dide divê neyê tecrîdkirin."

### DIVÊ TECRÎD BI DAWÎ BIBE

NEsrînê herî dawî wiha got: "Tecrîd ne çareserî ye. Berovajî vê pirsgirêkan kûrtir dike. Divê tecrîd demildest bi dawî bibe. Armanca tecrîdkirina Rêber Apo ew e ku tenê ji berjewendiyên hêzên navneteweyî re xizmet bê kirine. Divê demildest ev nêzîkatiya li dijî tecrîdê bê guhertin. Her wiha Rêber Apo di heman demê de ji bo azadî û mafên hemû jinên cîhanê li berxwe daye. Divê hemû jinên li cîhanê xwedî li felsefeya Rêber Apo derkevin."…*JINNEWS*

# Divê em li dijî êrîşan bibin yek

**Li dijî gefên dewleta Tirk yên li dijî Bakurê Sûriyê partiyên siyasî yên Rojava helwest nîşan dan û xwestin ku her kes li dijî van êrîşan bisekinin. Partiyan bi daxuyaniyan diyar kirin ku ev gefên Tirkiyê ji bo têkbirina projeya biratiya gelan û jiyana hevbeş in.**




Partiyên siyasî yên Rojava xwestin her kes li pêşiya gefên dewleta Tirk a dagirker bisekinin û diyar kirin ku ev gefên Tirkiyê ji bo têkbirina projeya biratiya gelan û jiyana hevbeş in.
Derbarê gefên Tirkiyê yên dagirkirina Bakurê Sûriyê de, El-Partî Demokratî Kurdistanî-Sûriye, Partiya Yekitiya El-Şexîle Kurdistanî û Partiya Kesk a Kurdistanê daxuyaniyên ji hev cuda dan û teqez kirin ku divê her kes li pêşiya êrîşên dagirkeran bisekine.

**DIXWAZE DAGIRKERIYA XWE FIREH BIKE**

Daxuyaniya El-Partî Demokratî Kurdistanî-Sûriye wiha ye:
"Terorîst Erdogan gefan dike ku wê êrîşî Rojhilatê Firatê bike. Ev gef ji bo firehkirina dagirkirina xaka Sûriyê ne."
Beriya salan siyaseta guhertina demografîk li dijî gelê Kurdistanê ji aliyê rêjîmên desthilatdar ve li ser Kurdistanê pêk dihat, armanca wê qelskirina yekitiya wan gelan bû ku li dijî siyaseta diktatorî disekinin. Tiştê ku niha li bakurê Kurdistanê pêk tê, eynî wê zîhniyeta bi salan e. Rewşa Tirkiyê roj bi roj xirabtir dibe. Li aliyekî din Tirkiye bûye zindaneke mezin, bi deh hezaran ji welatiyan xistine zindanê. Erdogan û AKP`ê dît ku rewş her roj xirabtir dibe, ji bo wê hewl dide aloziya xwe derxîne derve.
Wek Partiya El-Partî Demokratî Kurdistanî-Sûriye, bang li hemû partiyan û hêzên Kurdistanî dikin ku bibin yek û li pêşiya êrîşan bisekinin. Em bang li hêzên aştîxwaz û demokrat li herêmê û cîhanê dikin ku van kiryaran şermezar bikin û êrîşên dagirkeran li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê qebûl nekin."

**DIVÊ LI DIJÎ ÊRÎŞAN BISEKININ**

Di daxuyaniya Partiya Yekitiya Kedkarên Kurdistanê ev tişt hate gotin:
"Careke din terorîst Erdogan bi tawanên derew dibêje ku ew ê êrîşên herêmên rojhilatê Firatê bike. Erdogan hemû biryarên navdewletî binpê dike. Piştî ku çeteyên DAIŞ`ê bi saya berxwedan û têkoşîna şervanên YPJ/YPG û QSD`ê têk çûn û piştî ku di aliyê aborî, siyasî û hundirîn de têk çû û piştî Efrîn û herêmên bakurê Helebê, careke din gefan li herêmên rojhilatê Firatê û Rojava dixwe.
Em wek Partiya Yekitiya Kedkarên Kurdistanê gefên Erdoganê dîktator şermezar dikin. Em bang li civaka navdewletî, hemû azadîxwazan, li tevahî cîhanê dikin ku li dijî Erdoganê faşîst û hovîtî û kiryarên wî yên terorîst û gefên wî li dijî gelê rojhilatê Firatê û Rojavayê Kurdistanê bisekinin.
Em bang li hemû gelê xwe dikin ku banga Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo seferberiyê pêk bînin."

**DIVÊ KOALÎSYON HELWESTA XWE NÎŞAN BIDE**

Partiya Kesk a Kuridstanê jî di daxuyaniya xwe de ev tişt got:
"Emê li dijî hemû gefên li dijî gelê me û projeya me ya demokratîk ku bi saya xwîna şehîdan û têkoşîna gelê berxwedêr hatiye avakirin, bisekinin.
Her çi qas şervanên QSD`ê çeteyên DAIŞ`ê têk dibin da ku wan tune bikin û gel ji zilm û zora wan rizgar bikin, Erdoganê faşîst parastina wan dike. Gefan li Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwe ku dê dest bi operasyonên leşkerî bike.
Îro careke din piştî şervanên QSD`ê serkeftinên mezin bi dest dixin û çeteyan di bargehên wan ên dawîn de li Dêrazorê tune dikin, Erdgon gefan li herêmên Rojava û rojhilatê Firatê dixwe.
Ji ber wê em bang li hemû hêzên demokratîk ên ku parastina azadiyê dikin ku li dijî gefên Tirkiyê û terora wê li dijî gelê me çi li Efrîn çi li herêmên din ên Rojava û Rojhilatê Firatê be destekê bidin me.
Em bang li hêzên Koalîsyona Navdewletî yên ku li dijî terorê şer dikin ku li dijî gefên Tirkiyê helwestên xwe diyar bikin. Em wek Partiya Kesk a Kurdistanê gefên dewleta Tirk a dagirker û serokkomarê wê yê ku destekê dide terorîstan, şermezar dikin."

## Rêveberiya Xweser seferberî ragihand




Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dijî gefên êrîşan ên Erdogan li herêmê seferberî îlan kir.
Meclîsa Rêveber a Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê daxuyaniyek nivîskî da, li dijî gefên êrîşan ên Serokkomarê Tirk Recep Tayyîp Erdogan ên lis er Bakûr û Rojhilatê Sûriyê seferberî ragihand.
Rêveberiya Xweser anî ziman ku Erdogan ne tenê herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dike hedef di heman demê de yekbûna xaka Sûriyeyê jî dide hedef û ev tişt got:
"Bi navê Meclîsa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê daxuyanî û gefên dijminahî yên Erdogan li dijî herêmên me şermezar dikin. Erdogan ji destpêka aloziya Sûriyê ve hewl dide, beşek ji axa Sûriyê qut bike û tevlî nava axa Tirkiyê bike, bi vê yekê dixwaze sînorê El-Mîsaq Milî vegerîne. Armanca Erdogan ne tenê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, armanca xwe yekîtiya axa Sûriyê ye.
Di demeke ku DAÎŞ`ê nefesên xwe yên dawî li Dêra Zorê dikşîne, Erdogan hewl dide bi rêya gefan Sûriyê dagir bike, da ku zextê li ser wê kêm bike û temenê wê dirêj bike. Di heman demê de, armanca dewleta Tirk derbkirina hevgirtina civakî ya Sûriyê û jiyana hevbeş a di navbera pêkhateyên gelê Sûriyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, ji ber ku li ser xwe berjwendiyên xwe metirsî dibîne.
Her wiha ev daxuyaniyên dijminahî destkeftiyên ku Dewletên Koalîstona Navneteweyî ya şerê li dijî terorê û têkbirina wê di cihê wê yê herî dawî de, bidest xistine, armanca digre. Di heman demê de, rewşa ewlehiyê ya ku gelê me Sûriyê li Rojhilatê Firatê dijî, armanc digre, ji ber sîstema Tirkiyê ji rewşa ewlehiyê ne razî ye.
Em Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bang li civaka navneteweyî û di serî de Neteweyên Yekbûyî û Koalîsyona Navneteweyî ya li dijî DAÎŞ`ê dikin ku li dijî planên Erdogan ên dijminahî helwest bidin. Ji ber qanûna navneteweyî binpê dike û dagirkirin bixwe jî binpêkirina peyamên navneteweyî ye. Em bang li dewletên ku cihê xwe di nava NATO de digrin, dikin ku li dijî siyasetên Erdogan bisekinin, ji ber ku ne li gorî rêgezên NATO`yê. Ji ber ku Erdogan herêmeke ku tu xeterî li ser ewlehiya wê çênake, dike hedef.
Di heman demê de, em bang li hikumeta Sûriyê jî dikin ku helwestekî fermî li dijî van gefan nîşan bide, ji ber ku Erdogan dixwaze beşekî ji axa Sûriyê dagir bike û ev yek jî tê wateya binpêkirina serweriya Sûriyê.
Her wiha em bang li hêzên demokratîk ên li herêmê û cîhanê dikin ku li gel vîna gelên herêmê bisekinin û bi me re li dijî hevkarê DAÎŞ`ê Erdogan bisekinin. Di heman demê de li dijî şerê qirkirinê yê ku Erdogan li dijî me ragihandiye bisekinin.
Em Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê seferberî radighînin, bang li hemû gelê Sûriyê yên xwedî şeref dikin ku bi yek destî li dijî siyasetên dagirkirinê yên dewleta Tirk rabin. Îro roja ku em hemû hêza xwe ji bo parastina ax û gelê xwe bi kar bînin. Divê em her tiştî bikin ku yekîtiya axa xwe û biratiya gelan biparêzin."

## Em ê li hember planên dagirkeriyê bisekinin

Hevserokê Meclisa Kantona Girê Spî Hemîd El-Ebid destnîşan kir ku armancên gefên Tirkiyê ku zexta li ser çeteyên DAIŞ`ê kêm bike û hevgirtina civakî têk bibe û wiha got: "Em nahêlin rejîma Erdogan derbeyê li hevgirtina civakî bixe."
Hevserokê Meclisa Kantona Girê Spî Hemîd El-Ebid teqez kir ku ew nahêlin Tirkiye derbeyê li hevgirtina civakî li herêmê bixe û da zanîn ku ew ê li hemberî planên Tirkiyê bibin yek.
Serokê rêjîma Tirk Recep Erdogan gef li Bakurê Sûriyê xwar û diyar kir ku ew ê li dijî Rojhilatê Firatê dest bi êrîşê bikin û dagir bikin.
Hemîd El-Ebid da zanîn dema ku nefes li çeteyên DAIŞ`ê teng dibe, Erdogan ji bo zexta li ser çeteyan kêm bike, gefan li herêmên Bakurê Sûriyê dixwe. El-Ebid wiha got: "Beriya demekê Erdogan gef li herêmên Serêkaniyê û Girê Spî xwarin, gefên wî ji bo herêmên Ereban in û seferberî li herêmên Bakurê Sûriyê ragihand. Em nahêlin Erdogan hevgirtina civakî li herêmê têk bibe."
El-Ebid destnîşan kir ku jiyana hevbeş di nava hemû pêkhateyên li Bakurê Sûriyê de xweşiya Erdogan nayê û wiha pê de çû:
"Li hemberî bêdengiya civaka navneteweyî û hikumeta Sûriyê li hemberî van gefan em matmayî ne, ji ber armanca wê dagirkeriyê ew e ku hin herêmên Sûriyê tev li Tirkiyê bike."
Hevserokê Meclisa Kantona Girê Spî Hemîd El-Ebid teqez kir ku ew ji gefên Tirkiyê natirsin û gotinên xwe wiha bi dawî kirin:
"Ev ax axa me ye û axa bav û kalên me ye û axa Sûriyê ye, em nahêlin kes axa me dagir bike."...
*ANHA*





# KNK'ê Cejna Ezî pîroz kir

**Konseya Rêveber a KNK'ê Cejna Êzî pîroz kir. Di peyama pîrozbahiyê de hate diyarkirin ku girîng e ku civaka Kurdên Êzidî û bi taybetî Êzidiyên derveyî welat, bawerî û çanda xwe biparêzin û xwedî lê derkevin. KNK'ê got, "Pêwîste xelkê Şêngalê yê koçber vegerin ser axa xwe. Pêwîste gelê me yê Êzidî, bi awayekî xweser, ew xwe bi xwe rêve bibin."**

Konseya Rêveber a KNK'ê Cejna Êzî pîroz kir. Di peyama pîrozbahiyê de hate diyarkirin ku girîng e ku civaka Kurdên Êzidî û bi taybetî Êzidiyên derveyî welat, bawerî û çanda xwe biparêzin û xwedî lê derkevin.
Konseya Rêveber a KNKê bi peyamekê Cejna Êzî pîroz kir.
Di peyama KNK'ê de ev tişt hate diyarkirin:
"Em, Kongreya Neteweyî ya Kurdistan (KNK), Cejna Êzî di serî de li Civaka Êzdiyan, li Gelên Kurdistanê û tevayî mirovahiyê pîroz dikin. Her weha em hêvîdar in ev cejn bibe wesîleya aştî, azadî û biratiya gelan.
Sê sal beriya niha bi berxwedaneke mezin, Şengal hate azadkirin. Ew êşa mezin ya Fermana 73'emîn hinek be jî hate kêmkirin. Lê mixabin koçberên Şêngalê heta niha jî, bi temamî venegerîne ser axa xwe û weke tê xwestin Şengal nehatîye avakirin. Pêwîst e rewşa Şêngalê bi awayekî taybet û hesas bê destgirtin. Parastin û avakirina Şêngalê wezîfeya hemî hêzên Kurdistanî ye. Pêwîst e xelkê Şêngalê yê koçber vegerin ser axa xwe. Niha dem dema vegera welat e, dem dema avakirina Şêngalê ye. Pêwîste gelê me yê Êzidî, bi awayekî xweser, ew xwe bi xwe rêve bibin.
Bi van hêvîyan em careke din, Cejna Êzî li civaka Êzdiyan û tevahiya mirovahiyê pîroz dikin."




## Tevî dagirkeriyê jî civaka Êzidî dev ji baweriya xwe berneda



Tevgera Civaka Demokratîk Cejna Êzî li civaka Êzidî û hemû civak û gelên herêmê pîroz kir. Her wiha bang li hemû xêrxwaz û demokrasîxwazan kir ku yekitiya xwe li ser esasê pîvanê biratiya gelan ava bikin.
Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) bi boneya Cejna Rojiya Êzî daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin:
"Bi boneya Cejna Rojiya Êzî ya ku dikeve 14`ê Kanûnê, em li civaka Êzidî û tevahî gelê Kurdistanê pîroz dikin. Em bi hêvî ne ku ev cejn bibe cejna aştî û xêrê da ku hemû gelên cîhanê bi aramî û aştî bijîn.
Em wek TEV-DEM bi hemû hêza xwe ya fikrî, civakî û jiyana hevbeş di navbera çandên herêmê de, hewl didin doz û pirsgirêkên ku di nava dîrokê de ji ber polîtîkayên şaş ji aliyê dewletên şovenîst û faşîst ve li herêmê derketin ku civakên me parçe kirin, çareser bikin.
Bi vê boneyê em civak û gelên herêmê pîroz dikin. Em bang li demokrasîxwazan dikin ku yekitiya xwe li ser esasê pîvanê biratiya gelan ava bikin. Civakên xwe yên azad li ser esasê wekheviya di maf û erkan de di çarçoveya sîstema demokratîk û saziyên civakî yên azad de ava bikin.
Em vê yekê ji xwe re wek zemîn dibînin da ku em teqez bikin ku dê Efrînê ji dagirkeriya Tirkiyê, rizgar bibe. Tevî ku civaka Êzidî bi darê zorê neçarî koçberiyê bû û xwe li herêmên Şehbayê bi cih kir, lê rê û resmên xwe bi îradaya xwe pêk tînin.
Careke din em civaka Êzidî bi boneya Cejna Rojiya Êzî pîroz dikin."

## Greva birçîbûnê ya li Hewlêrê dewam dike

Greva birçîbûnê ya li Hewlêrê ku li dijî tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dest pê kir, di roja 23'an de ye.
Greva birçîbûnê ya li dijî tecrîda li Îmraliyê û piştgiriya ji bo Hevseroka KCD'ê û Parlamentera HDP'ê Leyla Guven bi pêşengiya Nûnertiya HDP'ê ya li Başûrê Kurdistanê pêk tê û di roja 23'an de ye.
Greva birçîbûnê bi koma 12'emîn dewam dike ku ji jinan pêk tê.
Endamê HDP'ê Nasir Yagiz jî 23 roj in bi tena serê xwe bi rengekî bê dorveger û bê dawî di grevê de ye.
Endamên HDP'ê diyar kirin, heta ku tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û dîlgirtina parlamenterên HDP'ê dewam bike, wê çalakiya xwe bi dawî nekin.
Partî û rêxistinên li Başûrê Kurdistanê jî her roj serdana çalakgerên grevê dikin. Nûnerên HDP'ê diyar kirin, gef û êrîşên dewleta Tirk ên li dijî gelê Kurd roj bi roj zêde dibin û gotin, divê desteka ji bo çalakiyê zêdetir bibe.
Nûnera HDP'ê ya Başûrê Kurdistanê Muzeyen Guneş got, "Tirkiye ne tenê gefê li Bakur dixwe, her wiha gefê li Başûr û Rojava jî dixwe."




## Li dijî êrîşên dagirkeriyê şoreşa me wê bidome

Saziya Yekîtî û Piştgiriya Gelan (SYPG) bersiv da gefên Serokê rejîma Tirk Erdogan û got: "Li dijî êrîşên dewleta Tirk a dagirker şoreşa me wê bidome."
Saziya Yekîtî û Piştgiriya Gelan (SYPG) ragihand ku dewleta Tirk carekî din li dijî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê şer îlan kiriye. Hate gotin ku armanc ji holê rakirina destkeftiyên Kurdan û gelên herêmê ye.
SYPG wiha got: "Ditirsin, dîktator Erdogan û dewleta faşîst a Tirk a dagirker ji tirsa diricife. Ditirse ku bayê azadiyê sîstema kapitalîst a bê exlaq, bêhn dayî û ketî çiravê hilweşîne. Dibînin ku dor hatiye wan û ji bo wê ziravê wan diqete. Ev dijminên mirovahî û azadiyê ne."
SYPG'ê anî ziman ku her ku çeteyên DAÎŞ'ê tengav dibe û nefesa xwe ya dawî dikişîne ev êrîşên dewleta Tirk a dagirker ku hevkarê wê hêz dide wan û got: "Li Kobanê jî heman tişt kir, dawiya xwe anîn. Çawa çeteyên DAÎŞ'ê me avêtin sergoya dîrokê wê dewleta faşîst a Tirk jî biçe sergoya dîrokê."
SYPG'ê li dijî êrîşan banga rabûna ser lingan kir û got wê li her enî û çeperên wê li ber xwe bide û şoreşê bikin.
SYPG'ê wiha got: "Banga Seferberiyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya ji bo şoreş, azadiyê ya li dijî êrîşên dewleta Tirk a dagirker kirî di cih de ye, bang dikin ku divê gelê me li her qadê dakeve kolanan, azadiyê mezin û çeperan xurt bike."

